

## Çima me jina rexnegir tune ye?

Niha jî li ser vê baweriyê bê biguman mêzey şiyana jineke nivîskar dikî. Bi mebesta bikêmzanîn ji feyde û şiyana jinê digotin li pişt her jineke wêjeyî de zilamek heye ku ji bo vê dinivîse, ma ev nine ku bi mebesta di çarçoveyê de ragirtina jinê...

dom»R:10





## Ber bi kîderê?

Çîroka Rojhilata Navîn, çîroka sitemkarî û bêdadî ji aliyekê û ewlehî û geşekirin ji aliyeke din ve ye. Sitemkarî û bêdadî li her cihekê hebe, ewlehî û geşekirina civakê li wir lawaz dibe, lê desthilatdarên zordar ên li Rojhilata Navîn, bervajiyê vê yekê dihizirin! Zordarên wek desthilta Pehlewî yan rêjîma Esed û Beisa Îraqê û li wan 4 dehikan de jî rêjîma koloniyalîstiya wilayeta feqîh, wa hizir dikin ku bi zorê û bi serkutkirinê dikarin .....

dom» R:2


*Bideŝtveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (479) 06-10-2024 Buha (1000) Tûmen*




## Werîsê Iranê bû hirî

Di 1'ê Cotmeha 2024'an de Komara Îslamî ya Îranê duyemîn êrîşa xwe ya rasterast li dijî Îsraîlê pêk anî. Êrîşa ku bi navê " Wada Sadiq 2" hat binavkirin, piştî Îsraîlê di çend qonaxan de pêk hat, pêşî bi teqandina pêycêran, piştre bêtêlê, piştre kuştina fermandarên pileya yekem û duyemîn ên koma terorîst a Hemasê û di dawîyê de kuştina kiryareke din ya Hesen Nasrallah Hizbullah. derbeke bibandor li laşê Hizbullahê ku bi sîxurê Komara Îslamî ya Îranê li dijî Îsraîlê tê naskirin.

dom» R:4

# Xwe rêkxistina Kurdan hewce ye



N. Nûredîn Sofîzade



Di nava agirê herêmî de, di nava bûyerên derdora me, di nava guhertinên ku têne pêşbînîkirin, em kîderê ne? Em divê çi bikin?

Em Kurd ku ji hemî hêlekê ve bindest û mafxwarî ne, ji aliyê hikumetên dagîrkar ve hatine bê maf kirin, Kurd û Kurdistan hertim li ber gefa êrîşê de ye û dujmin cehdê dikin ku Kurdan bihelînin, û ev dengê cuda cuda ye mafxwaziyê û tevgerên azadîxwaziya wan bifetisînin û bê deng bikin.

Niha ku Herêma Rojhilata Navîn bi sedema şerê di navbera Îsraîl û girûpên milîşiyayî û bi taybetî rêjîma Îranê de ye, û roj bi rojê egera berfirehtirbûna şer zêdetir dibe û gelek nayê zanîn ku şerekî giran û yêkalîker di nabera Îran û Îsraîlê de biqewme, û hekî ev yêke jî çêbe, bê guman cemser û aliyên cuda dê çêbin û renge welatên xwedî bandor û bi taybetî Amerîka û Ewropa û welatên nawçê nekarin bê helwêst bin, vê demê me Kurdan çi kiriye? Di nava wan bûyeran de berjewendî çiye û Kurd kîdera wan bûyeran de cih digrin?

Bê guman hekî ev şerê pêşbînîkirî biqewme, dê gelek guhertinên bingehîn bi du xwe de bîne, herçiqas her nihade û hela bibê êrîşa Îsraîl bo ser Îranê, gelek derencam bi du xwe de anîne.

Ev şera dikare hevsengiya hêzan biguhere û tenanet dikare bibe sedemê guhertina jiopolitîk û cografiya û pêkhata sinûran jî.

Li demekê de ku Kurdistan li wê nawçê de hilkevtiye, li demekê de ku Kurd bi ser aliyê kêm 4 welatên vê herêmê de hatiye parvekirin û axa Kurdan hatiye dagîrkirin, û Kurd ji heçî mafekî berheqe netewî hatine bêparkirin û bi dirêjiya dîrokê xebat kiriye bo geheştina bi mafê xwe, bê guman heçî kîjan ji wan 4 welatên dagîrkerê Kurdistanê nikarin li pirîşkên agirê nawçê bi dûr bin û nikarin li hember wan bûyeran de bê helwêt û bê alî bin.

Gelê Kurd çavan dikare wan aloziyan bo xwe bi derfet bizane û mifahê jê wergire?

Kurd dive berî her tiştî yêkgirtî be û netifaqî û diberiyên xwe danê qiraxê û li henber wan bûyeran de xwedî berhevdan û yêk gotara netewî be.

Kurd dive xwe rêkxistin bike û amadekariya her pêşhatekê bike ku li egera guhertinan de dîsan mayepûç nemîne û tenê zerermendê di nava wan aloziyan de be.

Kurd dive xwedî gotarekî hevpar be li derheq mafê çarenivisiya xwe û bikare xwe li cem welatên nexşekêşê bi hiz ên cîhanê de, xwedî bandor û wekî hêzeke şûndaner bide xuyakirin.

Kurd dive aliyê kêm li heçî kîjan ji perçên Kurdistanê û bi taybet li Rojhilatê Kurdistanê pilan û piroja xwe hebe bo heçî guhertinekê.

Kurd hekî çi bi berçavgirtina xebata rizgarîxwazane ye wê û daxwaza mafê netewî, ne dikare û ne dixwaze ku bibe altirnatîv bo deshilata giştiye welatên ku bi ser de parvebûye, lê aliyê kêm dikare bi yêkîtî û hêza xwe û yêk gotariya xwe, weke hêza dînamîk a xwedî derkevtin û beşdarî li nexşerêka pêşerojê bide xûya ku wisa nîşan bide ku bi bê beşdarî û hevrayî ya Kurdan çi altirnatîv û pilanek nikare serkevtî be.

Xala dawî û ya girîng: Bi berçavgirtina derbasbûyî ya Îranekî mezin û bi hêz çi li serdemê hikumeta paşayetî de û çi li serdemê rêjîma Îslamî de, hem welatên nawçê û hem welatên xwedî bandor û mezine cîhanê hest bi aramî û ewlehiyê nekirine, lewma Kurd li Rojhilatê Kurdistanê dive bi yêkitî û yêkrêzî û yêkgotariya aliyên siyasî û şorişvan û çavê hemî xelkê Rojhilatê li wane, bikarin xwe rêkxistin bikin û amadekariyê bikin û piroje û bername hebin bow ê ihtmalê ku cîhan geheştibe vê encamê ku dive saxtara cografiyaya Îranê bê guhertin, û Kurd giraniya xwe dabe nîşandanê ku dikare ji qewara Kurdistanê xwedî derkeve.

Hekî Kurd yêkrêz û yêkgotar nebe, bêgoman her wekî gelek carên din, wê care jî xewna dîrokiye Kurdan dê bibe bilqên ser avê û ev derfet jî ji dest here.



## Xweŝtek, têgihiştin û bijarde di pevçûnên navbera Îran û Îsraîlê de

dom» R:3



## Şerê Îranê û Îsraîlê, derfeteke nû bo xurtkirina Şoreşa "jin, jiyan, azadiy"ê .

dom» R:6

# Ber bi kîderê?



N. Kerîm Perwîzî
W. Bêhzad Simko

Çîroka Rojhilata Navîn, çîroka sitemkarî û bêdadî ji aliyekê û ewlehî û geşekirin ji aliyeke din ve ye. Sitemkarî û bêdadî li her cihekê hebe, ewlehî û geşekirina civakê li wir lawaz dibe, lê desthilatdarên zordar ên li Rojhilata Navîn, bervajiyê vê yekê dihizirin!

Zordarên wek desthilta Pehlewî yan rêjîma Esed û Beisa Îraqê û li wan 4 dehikan de jî rêjîma koloniyalîstiya wilayeta feqîh, wa hizir dikin ku bi zorê û bi serkutkirinê dikarin ewlehiya xwe dabîn bikin û aboriya desthilata xwe bi pêş bixin, hekî sitem û bêdadiyê jî bikin, ew li pêxema dabînkirina ewlehî û aramiyê de bûye! Li hizra wan de nîne ku dabînkirina ewlehiya demdirêj, bi beşdarîkirina xelkê tê dabînkirin û geşeya aborî jî bo geşeya jiyana xelkê ye ne bo dabînkirna bûdcê bo desthilatdariyê û hêzên serkutker ên vê desthilatê.

Bi sedema vê dîtingehê ye ku rêjîmeke sitemkar wek rêjîma Xumêynî-Xamineyî, têza ewlehî û mana xwe bi vê girê dane ku li dever û derveyî sînorên Îranê, berdewam kirîz hebin da ku wek desthilatdarê Têhranê, dorgeya ewleh a deverê bin. Hem xelkê navxweyê Îranê ji aloziyên deverê bitirsin û bibêjin ku naxwazain aloziyan bibine navxwe û hem welatên Rojavayî, Ewropa û Amerîka ji vê nigeran bin ku li Rojhilata tejî aloziyê de, Îrana aram, aloz nebe û Rojhilata Navîn bi tevahî bibe deryaya nearamiyê!

Lewma rêjîma Koledar a Têhranê, berdewam li çêkirina kirîzan li derdor de rol hebûye û her ji tirsê serhildana xelkê navxwe be jî, dixwaze derveyî sînoran dest li tawankariyan de hebe da ku xelkê navxwe çavtirsandî û bêdeng bike!

Qonaxeke din a dîroka Rojhilata Navîn ji 7ê October a 2023 ve dest pêkiriye û ew demsala nû, sîstemeke nû jî li pey xwe tîne.

Li demekê de ku asayîkirina pêywendiyên Îsraîl û welatên Erebî bi rê ve diçon, rêjîma Îranê bo têkdana vê pêvajoya aramkirin û asayîkirinê de Hemas han da bi nirxa têdeçona xwe û Xezê, rêgirî ji vê pêvajoyê bike û dever bi nişkêve kevte nav şerek din.

Bûyerên li 7ê October û cinayetên qewimî li vê rojê, raya giştiya Îsraîlê bi tevahî lerizand. Li roja paştir de Hizbullahê bi hêceta piştevanîkirin ji Xezê û kiryarên Hemasê, dest bi avêtina katyûşa û mûşekan kir!

Hûsiyan jî carûbar mûşek û diron dihavêtine Îsraîlê û milîsên ser bi rêjîma Têhranê li Îraqê de jî her dem carekê, xwe tevlî wan aloziyan dikirin! Rêjîma Îslamiya Têhranê jî bi eşekere bas ji vê dikir ku piştevanî li wan kiryaran dike û çek û diraf dide wan!

Xevna aloz û tirsnak û kabûsa Îsraîliyan bibû rastî! Şerê man û neman dest pêkiribû.

Komara Îslamî wa hizir dikir ku bi hêzên destçêkiriyên xwe, dora Îslaîlê girtine û Îsraîl hêdî-hêdî li nav şer de dihele û xwe jî ji dûr ve bi gefxwarinan û şandina diraf û çekan, ewlehiya xwe dabîn dike! Efsaneya jinavbirina Îsraîl bo serokên rêjîma wilayeta feqîh, dibû rastî!

Îsraîlê li hember de dixwest pêngav bi pêngav, girûpên destçêkiriyên rêjîmê bide qiraxê û rasterast rûberûyê rêjîma Îranê bisekine. Carekê spaha pasdaran li şanoyeke tolhildanê sedan mûşek û diron avêtine Îsraîl û ew bi tenê şano bû û Îsraîlê jî bersiveke gelek kurt da. Lê ev pêvajo nû gihîştibû qonaxa şerê rûberû digel rêjîma Têhranê û kiryarên vê! Lê rêjîma wilayeta feqîh ji vê tênegihîûştibû û wa hizir dikir ku her wek caran e.

Vê carê Îsraîlê rasterast operasiyonek li Têhranê bi rê ve bir û serokê Hemasê kuşt û her çiqas ku nekêşaye ustiyê xwe, piştre serokê Hizbullahê û hejmarek fermandeyên spaha pasdran jî digel de kuşt!

Êdî şer gihîşte qonaxeke nû: gelo rêjîma Têhranê dê xwe tevlî vî şerî bike, an dê xwe bi dûr bigre û hêzên destçêkiriyên xwe li nav destê Îsraîlê de bi tinê bihêle?

Êwara roja yekem a heyva October a 2024, çend rojan berî salvegera 7ê Octoberê û şevekê piştî destpêkirina êrîşa bejayî ya Îsraîlê bo ser başûrê Lubnanê, rêjîma Têhranê vê carê bi fermana şêwreya ewlehiya rêjîmê û bi gotina xwe bi hevbeşiya hemû hêzên çekdarên wek spaha pasdaran, artêş û wezareta Berevaniyê jî 200 mûşekên balistîkî avêtine Îsraîlê û



piştî 12 xulekan mûşek gihane Îrsaîl! Ew webûna deriyek nû ji aloziyên li navbera Îsraîl û rêjîma Îranê bû!

Rêjîma wilayeta feqîh, her çi qas ku pêştir Amerîka û Rûsiye ji êrîşkirina xwe agehdar kiribûn û îsraîl bi vê rêyê agehdar bibû û xisareke wiha nedît, lê sînor şikandibû û mûşeka balistîkî li Îsraîlê dabû! Hemû cîhanê jî ew yeka didîtin!

Rêjîma Xamineyî, piştî vê êrîşa mûşekî di cihê sehkirina bo gotina xwe “Bazdarendigî” dabîn kiribe û ewlehiya rêjîmê zêde kiribe, rast bervajî, ewlehiya rêjîmê daxist û beşeke zêde ji xelkê Îranê rûkê nêzîkbûna şerê li navbera Îran û Îsraîlê hate berçav û alîgirên rêjîmê di cihê sehkirina ewlehî, tirsa jinavçona rêjîmê kevte dilê wan. Xamineyî hate nimêja Înê da ku dilê alîgiran xwe xweş bike û bi Hizbullah, Hemas, Hûsiyan û milîsên din li Îraq û Sûriyê re bibêje ku serê ejdehayê terorê, li Têhranê, her zindî ye û pişta wan digre, lê ew jî vê carê axivîn jênedihat û gevî jêkevtibû hev! Merg û nemana rêjîmê bi çavên xwe dibîne hekî rewşê tundtir bike! Lewma bilî hinek dirûşman hewl da ku mijarê bêxe aliyê lojîk û berbiaqiliyê! pêka lojîk û hizrîna wilayeta feqîh jî parastina nizamê ji waciban wacibtir anku ji hemû hewcehiyan hewcehtir e! lewma êdî soza jinavbirina Îsraîlê neda!

Piştî vê yekê dê çi bibe? Dever ber bi çi qonaxekê ve diçe? Sîstema nû dê çawa be?

Pirsyareke girîng e ku renge bersiva vê bi hêsanî neyê peydakirin, lê gelek jî dirêj nabe da ku em bi çavên xwe, bersivê bibînin, çimkî Rojhilata Navîn ji kelînê derbas bûye û peşqelên agir belav dike û lewma dihûnê Hesen Nesrullah digot ku em dê keniya Îsraîlê bikin girî, îro bi xwe tê de ço û Hizbullah jî kevtiye tana canê xwe.

Pêvajoya bûyeran li ser vê ku em bigihîjin bersiva serastî, nasekine!

Ew eşkere û rohn e, Îsraîl dê bersiva êrîşa mûşekiya Têhranê bide, îja bersiv sînordar an her curekê be, lê dê bersivek be ku cîhan lêkevt û agirê vê bibîne!

Piştî vê yekê, tevahiya fokosa Îsraîl bi ser Lubnanê ye û renge Îraqçî yê wezêrê derve jî çobe Lubnanê da ku belku digel Firanse û Amerîkayê satûsewdayekê bike û bi agirbestekê Hizbullahê ji jinavçonê biparêze, lê Îsraîl ewlehiya demdirêj dixwaze û ew bi tenê bi çekkirina Hizbullahê tê kirin.

Pirseke gelek girîng li vê navberê de ev e ku gelo komara Îslamî bi satusewda û êrîşa şanoyî ya hevahengkirî, xwe ji vê rizgar dike an ne, bi hizra min pirsa girîng ev e ku bi 12 xulekan mûşekên balistîkî yên spaha pasdaran digihîjne nav axa Îsraîl! îJa hekî wa bihesibînin ku ew hevahegkirî be an ne û di cihê kumikên şer kumikên navkî pêve be, encama êrîşa mûşekiya bi wî awayî dê çawa be? Xo gunbeta asinî û qanîka Dawûd ku sîstema berevaniya Îsraîl li dema êrîşa mûşekî ne, hekî mûşeka balistîkî bi kumika navkî li esmanê Têlavîvê de derkeve, nikarin bikin armanc, çimkî vê demê li esman de bomba navkî dê bi ser wan de biteqe û tîrêja radioektîv dê devereke zêdetir ji nav bibe! Dê çi ji vê metirsiyê bikin?

Bi hizra min, bersiva wan pirsyaran li nav dilê vê wêneyê de hatiye veşartin.

# Xwestek, têgihiştin û bijarde di pevçûnên navbera Îran û Îsraîlê de





N. Elî Munezemî

Siyasetên nawnetevî dikarin li aliyên zaf teoriyên cihê reng ve bêne şirove û analîzkirin. Yek li wan teorîyên balkêş, teorîya bijartinên maqûl yan jîrane ye. Ew teorîya çarçoveyeke pir dîsîplînîye ku reftar û kiryarên bikerên maqûl yên xwedî armanc li ser bingeha nirx û mifahê dinirxîne û xwendinê bo reftara wan di pêşerojê de dike û texmîn dike ka ew aktor di rewşeke taybet de dikarin çi kiryarekê ji xwe nîşan bidin û diyardeyan li wê çarçoveyê de rave dike.

Ew aktor çi tak be yan hikûmet, bo ravekirina reftara wî/wê, li metoda takekesî mifah tê wergirtin.

Di wê gotarê de, emê şer û pevçonên navbera Îran û Îsraîlê di dema niha de, li çarçoveya wê teorîyê de bi kurtasî şirove bikin.

Li gor wê teorîyê aktor bi timî bijardeyên eqlanî û maqûl di pêxema xwestik û têgihîştina xwe hildibjêre. Yanî sê elementên xwestik, têgihîştin û bijarde bo bidestve anîna baştirîn destkevtê, girîngtirîn parên wê teorîyê pêktînin.

**Xwestik:**

Xwestik hêza handana merivan e bo xebatê di pêxema gihîştin bi armancê ku ew armanc dikarin altrûîstî (wekhevhezî) yan xweperestane bin. Lê di navbera xwestikan de nabe dijhevî hebe û xwestik dibe tevavkerê hev bin û dibe pêkanîna wan xwestikan ber bi aqil û mumkin be.

Her wisa xwestik dibe paşejojdar û pêştî pêkhatinê xwedî îstîqrar be. Ew xwestik dibe yên aktor bi xwe bin û di bin zext û guvaşa kesek din de ew yek xwe re nekiribe armanc.

Îran her tim bi gotin armanca xwe di şer û dijminatiya tewî Îsraîlê girêdide bi rizgarkirina xelkê Filistînê û hebûna Îsraîlê di herêmê de bi pîlana dewletên Rojavayî, bi xasma Birîtaniya û Amrîka dihesibîne û li ber hindê jî dibêje ku dixwaze Îsraîlê tune bike.

Bo realîzekirina wê armancê, hindek grûpên terorîstî di Lubnan û Filistînê de pêk anîne û bi rêya manîpulasyona wan we, dixwaze wê armanca xwe realîze bike.

Lê Îranê di bin wê armancê de gelek armancên xwe yên weşartî hene. Li hêlekê dixwaze xwe wek rêberê cîhana Îslamê bide nîşandan û li hêlek din jî bo desteberkirina armancên xwe yên aborî, leşkerî, siyasî û jeopolîtîk dixwaze serdestîya xwe di Rojhilata Navîn de bide qebûlkirin. Li ber hindê jî dijminatiya tewî Îsraîl baştirîn hecet û wesîleye bo gihîştina rejîma Îranê.

Li hermber de jî Îsraîl dixwaze ewlehîya welat û neteweya xwe biparêze û bo wê armancê jî nehêlana grûpên terorîstî di Lubnan û Filistînê de xala herî girîng û esas e. Lê bi hebûna rejîma Îranê û piştgirîya bi îmkanatên madî, çekdarî û teknolojîk hwd.

a wan grûpên terorîstî, Îsraîl nikare wê armanca xwe pêk bîne. Li ber hindê jî Îsraîl cehd dike ku hem di hundirê Îranê de û hem jî li derveyî Îranê derbên giran li mohreyên Îranê û wan grûpên terorîstî biveşîne.

**Têgihîştin û bijarde**

Têgihîştinê ku peyvendî bi zansta aktoran bi şêweyeke sabjêktîv li ser cîhanê heye, dibe sedem ku ew aktor di rewşên cuda cuda de bizanin ka çi alternatîvek hene bo kiryarên xwe û ya hemûyan baştir hilbijêrin.

Lêre de bas ji hebûna înformasyonan tê kirin ku aktorek jîr re pêdivîye pêş hindê ku kiryarekê bike. Li ber hindê jî aktorên jî dizanin kengê kîjan pêngavê hilbigrin.

Bizavtek han dibe hind bi başî bê pîlankirin û lêkdan ku hemû aliyên wê bêne xwendin û nabe li ser hesaba ferzên giştî înduktîf bin.

Ji ber ku Îsraîlê kariye di rêka sîxurên MOSSADê ve zanyarîyên balkêş û nû li ser Îran û grûpên terorîstî yên Filistînî û Lubnanî dest xwe ve bîne, pêngavên ku hember wan radike, pêngavên girîng in ku dikare bi hêsanî derbeyên mezin li wan bide û kesên wan yên sereke bike armanc.

Lê Îran gava ku nikare hember wan zerbeyên Îsraîlê de tiştekê bike, wek dîn û haran tev digere û ewa ku nabe bike, dike.

Li alîyekê bi eşkere bi hajek û balafirên bêfirokevan hêriş dike ser Îsraîlê û li aliyek din jî bi eşkere li welatên Rojavayî dixwaze bi rêka terorê ve hêriş bike ser balyozxaneyên Îsraîlê.

Îran hemû wan yeka li ber çavên cîhanê û bîrûraya giştî dike û heta niha kariye wê fersendê bide Îsraîlê ku eger Îsraîl hêriş bike ser Îranê, ku hegera wê jî zor e, hemû cîhan Îsraîlê mafdar dizane.

**Encam:**

Karbidestên Îranê dane eyankirin ku aktorên belengazin li aliyê şiûr û têgihîştina xwe de. Li aliyekê ewê nakin ya aqil dibêje û li aliyek din jî mejiyê wan nabêje wan ku ewa dikin, nekin.

Ewan niha bi wê hêrişa ser Îsraîlê, li cîhanê re dane îsbatkirin ku mana wan li ser desthilatê dikare tehlûkeyên mezin bo hemû cîhanê hebin.

Ewa ku heya niha cîhanê çavên xwe li ser cinayetên rejîma Îranê derheq xelk û neteweyên bindest de girtibû û hember wan hemû cinayetan de bêdeng bûn, niha we jî îqna bûne ku mana wê rejîmê êdî ne hevceye û hêdî hêdî hemû aliyek dibe bibin dengê wî xelê bindest û bi pişgirî nekirina wê, rêka hiloşandina wê rejîmê vekin.

# Werîsê Iranê bû hirî



N. Dr. Mecîd Heqî



Di 1'ê Cotmeha 2024'an de Komara Îslamî ya Îranê duyemîn êrîşa xwe ya rasterast li dijî Îsraîlê pêk anî. Êrîşa ku bi navê " Wada Sadiq 2" hat binavkirin, piştî Îsraîlê di çend qonaxan de pêk hat, pêşî bi teqandina pêycêran, piştre bêtêlê, piştre kuştina fermandarên pileya yekem û duyemîn ên koma terorîst a Hemasê û di dawîyê de kuştina kiryareke din ya Hesen Nasrallah Hizbullah. derbeke bibandor li laşê Hizbullahê ku bi sîxurê Komara Îslamî ya Îranê li dijî Îsraîlê tê naskirin.

Îsraîl di nava du hefteyan de hemû veberhênanên Îranê yên ji bo xurtkirina Hizbullahê betal kir. Îranê di heyama 30 salên borî de nêzîkî 30 milyar dolar ji bo perwerde, rêxistin û alavên Hizbullahê xerc kiribû. Sermayek ku dikare gelek pirsgirêkên aborî, jîngehparêzî, xizanî û bêkariyê yên ciwanên Îranê çareser bike.

Êrîşa bi navê Waada Sadeq berdewamiya êrîşa meha Nîsanê ye û amaje bi hewlên demdirêj ên Îranê bo jinavbirina Îsraîlê dike. Îran bi êrîşa xwe digihêje armanceke din: Îsraîl mecbûr dike ku rîskên her êrîşekê li ser berjewendiyên Îranê binirxîne. Cihê êrîşa Îranê heta niha nehatiye eşkerekirin. Lê di derbarê Îranê de, hema hema hemû welatên rojavayî, di serî de Amerîka û hejmareke berçav ji welatên Yekîtiya Ewropayê, êrîşeke muhtemel a Îsraîlê bo ser Îranê rewa nîşan didin. Îran yekem windakerê navnetewî yê êrîşê bû.

Ji aliyeke din ve dibe ku welatên navçê û civaka cîhanî wisa hizir bikin ku piştî êrîşa Îranê, stratejiya Îranê ewe ku bi kar anîna potansiyela navokî bo afirandina pêleke tirsê li hember hêza leşkerî û hêzên berevaniya Îsraîlê. Bi gotineke din, dibe ku Îran di bin siya şerê Rûsya û Ukraynayê û şerê sala borî yê Xezzê de, gihîştibe asta amadebûna navokî ku dikare bibe gef li ser welatên herêmê û Îsraîlê.

Balansa nû?

Di salên derbasbûyî de, gefên Îranê yên li dijî Îsraîlê li ser du stûnên sereke bûn: cebilxaneya wê ya mûşek û firokeyên bê firokevan, û hêzên weke Hizbullah li Lubnanê û Hemas li Xezzeyê. Ev stratejî ku wek doktrîna berevaniya pêşîgir a Îranê tê naskirin, dixwest ku hêza xwe li derveyî sînorên xwe nîşan bide ji bo rûbirûbûna dijberên xwe bêyî ku rasterast tevlî şer bibe. Ev stratejî di sala borî de hêdî hêdî têk çû, bi taybetî piştî êrîşên Îsraîlê bo ser Hizbullaha Lubnanê û wêrankirina serkirdayetî û navendên fermandariya Hizbullahê.

Êrîşa 13ê Nîsanê piştî kuştina çend fermandarên Îranî li Şamê hat. Di wê êrîşê de, Îranê bi sedan mûşek û firokeyên bê firokevan êrîşî Îsraîlê kir - mezintirîn operasyona serbazî ya Îranê ji dawiya şerê Îran û Iraqê ve. Serdar Huseyn Selamî, Fermandarê Giştî yê spaha Pasdarên Înqilaba Îslamî got: "Me biryar da ku hevkêşeyek nû çêkin... Ji niha û pê ve, eger Rejîma Siyonîst êrîşî berjewendî, milk, kesatî û welatiyên me bike, dê li dijî vê yekê êrîş were kirin." Komara Îslamî ya Îranê ku rasterast êrişî Îsraîlê kir, hewl da ku rê li êrîşên paşerojê yên Îsraîlê bigire û rê li ber kuştina leşkerên xwe bigire, wek ku di 1ê Nîsanê de li Şamê qewimî.

Nîşaneyên yekem ên têkçûna stratejiya Îranê di 31.7.2024 de derketin Îsraîlê di êrîşa hewayî ya li Beyrûtê de yek ji fermandarên herî girîng ên Hîzbullahê kuşt. Kuştina Fûad Şukur, ku wek "giyanê veşartî yê Hizbullahê" tê naskirin, derbeyeke bibiryar bû li ser îmaja Hizbullahê. Serokê Hamasê Îsmaîl Henîyye piştî ku Mesûd Paşkian dest bi wezîfeyê kir, çend saetan li Tehranê hat kuştin. Êrîşeke ku gelek kes matmayî hişt û bû sedema şokeke derûnî ya rejîma Îranê. Tevî ku Îsraîl bi fermî berpirsyariya kuştinê negirtiye ser xwe jî, Îranê Îsraîl bi derbaskirina hemû xetên sor tawanbar dike, weke êrîşa 1'ê Nîsanê.

Di çend hefteyên piştî bûyerê de, Îranê gefa êrîşa li ser Îsraîlê xwar, lê bi behaneya danûstandinên agirbestê di navbera Îsraîl û Hemasê de, bi rêyên dîplomatîk hewl da ku rê li ber êrişên zêdetir ên Îsraîlê li ser navê "Eniya Berxwedanê" bi xercên xwe bigire. asta herî kêm li wê eniyê. Berovajî vê yekê Îsraîl ber bi eniya berxwedanê ve vekişiyaye, lewra gelek di nava Îranê de bawer dikin, ku Îsraîl Îranê teşwîq dike ku nakokiyên Îran û Amerîkayê li navçeyê kûrtir bike.

Di dawiya meha Tebaxê de, Hizbullah ji bo tolhildana kuştina Fûad Şukr, zêdetirî 300 mûşek avêtin Îsraîlê.

Belgeyên din ên têkçûna îdiaya "hevkêşana nû" ya Îranê êrîşa 27ê Îlonê ya Îsraîlê li ser baregeha serkirdayetiya Hizbullahê, kuştina Sekreterê Giştî yê Hizbullahê Hesen Nasrallah û kuştina Cîgirê Fermandarê Operasyonên Pasdarên Şoreşê Tûgegeneral Abbas Nilfroşan bû. Bê guman Hesen Nesrullah kesayeta herî girîng û binavûdeng a wekalet a Îranê bû, ku mirov dikare weke girêdana Îranê û tevahiya eniya "berxwedanê" bi nav bike. Îsraîl xeteke din a sor a Îranê derbas kir.

Helwestên Îranê yên di wê demê de nîşana nerazîbûna Komara Îslamî ya Îranê bû ji zêdekirina nakokiyan. Xamineyî got ku "eksena berxwedanê" bêyî Nasrallah dê bidome. Lê Îran ketibû du rêyên dijwar. Êrîşek li ser Îsraîl dikare bibe sedema şerekî dijwar bi Îsraîl û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re, ku xwedan teknolojiya berevanî û êrîşa pêşketî ne. Ji aliyekî din ve, nehiştina êrişan dê baweriya hevalbend û dijminên welêt têk bibe û lawaz bibe. Digel ku Îranê dikaribû hêzên din ên di "xembera berxwedanê" de, wek milîsên şîe li Iraq, Sûriye û Yemenê, ji bo êrişkirina ser baregehên Îsraîl û Amerîkayê bi kar bîne, windakirina rêberê Hizbullahê bi heman awayî bandor li "eniya berxwedanê û berxwedanê" kir. moralê tevahiya eniya berxwedana Îranê lawaz kiribû.

Hilweşîna ji nişka ve û lawazbûna Hizbullahê bû sedema tirsa rayedarên Îranê ku ew ê li dû Lubnan, Sûriye, paşê Iraq û di dawiyê de jî dora Îranê biçe. Rayedarên Îranê gihîştibûn wê baweriyê ku şer neçar e û ji ber vê yekê destnîşan kir ku însiyatîfa herî baş parastinê ye. Ji ber vê yekê, li şûna ku hûn ne amade ne û ji nişka ve werin tehdît kirin, ji bo rûbirûbûna xetereyê tevdîrên pêşîlêgirtinê bigirin.

Li hundir, tundrewên rejîmê bi tundî rexne li dîplomasiya eşkere ya Îranê di pêşvebirina reformên dîplomatîk û "dawendî" bi Rojava re dikirin. Şirovekirina wan ew bû ku eger tola kuştina Îsmaîl Heniye di dema xwe de bihata hilanîn, dibe ku pêşiya mi-

dom» R:5

# Werîsê Iranê bû hirî

dom» R:4

rina Hesen Nasrallah bihata girtin. Metirsiya potansiyela Îranê ji aliyê cebilxaneyên wê yên mûşekî û hêzên "alîkar" ve gelekî lawaz bû, û salek piştî êrişên terorîstî yên 7ê Cotmehê, Îsraîl serkirdeyên Eniya Berxwedanê yek li pey yê din dikuşt û ev yek nekir û bû sedem ku Îsraîl di cezakirina dijberên xwe de tundtir be. . Hizbullah, ku demekê weke keleha Îranê li hember Îsraîlê dihat dîtin, di nava çend hefteyan de heta asta wêrankirinê qels bû.

**Wada Sadiq 2**

Di 1'ê Cotmehê de Îranê herî dawî dest bi êrîşa xwe ya tolhildanê kir. Naveroka êrîşê ji ya Nîsanê gelekî cuda bû Îranê vê carê nêzî 200 mûşekên balîstîk avêtin ku dikarin di nav çend deqeyan de armancên Îsraîlê bixin. Îranê jî moşeka xwe ya herî pêşketî Fetih-1 bikar anî Şîroveyên destpêkê diyar dikin ku vê carê êrîşê zêdetir zirar daye Îsraîlê. Lêbelê, qurbaniyên Israelisraîlî hindik bûn, tenê kesek li Erîhayê hat kuştin û 2 kes jî li Tel Aviv birîndar bûn.

Karbidestên Îranê êrîşên 13ê Nîsanê û 1ê Cotmehê wek êrîşên Îsraîlî bo ser Komara Îslamî li Şam û Tehranê binav dikin. Li gorî Komara Îslamî ya Îranê, rejîm naxwaze alozî zêdetir berfireh bibe. Îran jî îdia dike ku êrîşa 1'ê Cotmehê ji bo xweparastinê li ser esasê peymana Neteweyên Yekbûyî bû, îdiaya ku Îranê bi rêya nûnerê xwe yê li Neteweyên Yekbûyî hewl daye li ser israr bike.

**Îran di du aliyên stratejîk de ye**

Stratejiya Îranê ya avakirina hêzeke bergiriyê dibe ku berovajî vê yekê derkeve. Avêtina mûşekên otomatîkî bi tena serê xwe rêgiriyek bi bandor naafirîne. Di şûna wê de, ji ber piştgirîya navneteweyî ya Îsraîl, Îran dê ji meha Nîsanê tundtir bersivê bide. Reaksiyona Îsraîl vê carê dikare xisareke rasterast a mezintir û berfirehtir bide Îranê. Piştî êrîşa Îranê ya li ser Îsraîlê, Serokwezîrê Îsraîlê Benjamin Netanyahu, yekser piştî êrîşa Îranê ya li ser Îsraîlê, soza bersivdayînê da û got, "Îranê îşev xeletiyeke mezin kir û wê berdêla wê bide. Rejîma Îranê ji îradeya me ya ji bo parastina xwe û hilanîna tola dijminan fêm nake."

Îsraîl êrîşî navendên navokî yên Îranê, yan jî parzûngehên petrolê yên Îranê bike û ziyanên aborî yan jî bingehên mûşekî yên Îranê bike, ew dikare Îranê bi awayekî berçav lawaz bike bêyî ku civaka navdewletî li dijî wê derkeve. Îsraîl niha li gorî xala 51. a Peymana Neteweyên Yekbûyî mafê xwe yê parastinê heye û ev êrîş dê Îranê ne tenê di warê leşkerî, aborî û navneteweyî de bi eşkere lawaz bike, lê dê bibe sedema travmayên kûr ên derûnî li tevahiya "eniya berxwedanê".

Bifikirin ku divê Îsraîl berdêla êrîşa xwe ya li ser Îranê bide. Berdewamiya Îranê ku nikaribe xwe bi bandor li hember Îsraîlê biparêze, dê hêzên wê yên wekalet li herêmê lawaz bike. Êrîşa Wada Sadiq 2 bû destpêka mirina Hîzbullah. Ji ber ku Îranê rola ku berpirsyariya Hizbullahê bû lîst. Êrîşa 1ê Cotmehê, her çend ji êrîşa Nîsanê bihêztir be jî, nîşan da ku ji bo guhertina hevsengiya hêzê, hebûna mûşekên menzîl dirêj têra hevsengkirina şiyanên leşkerî yên Îsraîlê neke yan jî bikeve nav şerekî berfireh û dirêj de.

Bernama navokî ya Îranê helbet yek ji piştgirên herî bihêz bû ji bo biryara êrîşa li ser Wada Sadeq. Weke welatekî li ber çêkirina çekên navokî, Îran xwediyê pêkhateyên sereke yên çekên navokî ye, di nav wan de materyalên fisîl, pisporiya teknîkî û pergalên radestkirina çekên navokî. Tevî îdiayên Îranê ku projeya wê ya navokî armanceke aştiyane heye, niha îmkanên wê hene ku gava dawî ber bi çêkirina çekên atomî ve bavêje. Lê nayê zanîn ku Îranê îhtîmala êrîşeke Îsraîlê bo ser tesîsên xwe yên nukleerî ku tijî uranyuma dewlemendkirî ya bi santrîfujên pêşketî ne, nirxandiye yan na.

Helwest û reftarên karbidestên Îranî di sala borî de nîşan dide ku Îran hêza xwe ya navokî ji ya ku rojava difikire zûtir zêde dike. Roja 10ê Cotmehê hin endamên meclisa şêwra Îslamî ya Îranê behsa guhertina doktrîna berevaniyê ya Îranê bo çekên navokî kiribûn. Eger ev axaftin tenê slogan bin jî, nîşana wê yekê ne ku Îran gav bi gav niyeta xwe ya rastîn derbarê projeya navokî de eşkere dike da ku bi kêmanî hêza xwe ya berevaniyê zêde bike.

Ji bo bidestxistina çekên nukleerî hîn rêyeke dûr û dirêj li pêşiya Îranê maye, lewra dibe ku Îsraîl vê derfetê bikar bîne û ezmûna Iraq û Sûriyê dubare bike. Eger Îran êrîşên xwe yên mûşekî bidomîne û Îsraîl ji her demê dijwartir bersivê bide, dibe ku di demeke dirêj de hemû hêzên Îranê yên potansiyela "pêşgir" têk bibe.

Piştî van şikestinên li pey hev, Hizbullah, tevî ku ji aliyê Îranê ve tê piştgirîkirin û ji artêşa Lubnanê û gelek welatên erebî zêdetir e, wê pir zehmete ku ji nû ve derkeve holê û bibe hêzeke cidî ya parastina berjewendiyên Komara Îslamî ya Îranê. .

Piştî têkçûna Hizbullahê, du bijardeya Komara Îslamî ya Îranê hene: yan rasterast rûbirûyê wê bibe û encamên hilbijartinan qebûl bike yan jî hewla çareseriya siyasî bide û dev ji dirûşma jinavbirina Îsraîlê berde. Wezîrê Karên Derve yê Îsraîlê Îsraîl Katz ji Xamineyî re got: "Nabatên xwe bigirin û ji Libnanê derkevin."

Ji bo tevgera neteweyî ya Rojhilatê Kurdistanê derfetek?

Êrîşa Îranê ya li ser Îsraîl ti prensîbên xala 51ê ya Peymana Neteweyên Yekbûyî pêk nayê.

**1.** Îsraîl kuştina Heniye qebûl nekiriye û Îranê jî tu delîlek nîşan nedaye ku Haniye ji aliyê dewleta Îsraîlê ve hatiye kuştin. Herwiha Haniye ne hemwelatiya Îranê ye, ji ber wê jî mafê wî welatî heye ji bo tolhildana kuştina mêvanê xwe yê ezîz êrişî welatekî din bike.

**2.** Kuştina Nasrallah li gorî qanûnên navneteweyî ti pêwendiya xwe bi Îranê re nîne û êrîşek li dijî welatekî serbixwe yê endamê Neteweyên Yekbûyî nîne.

**3.** Pasdarên Şoreşê Abbas Nîlfroşan ne li balyozxaneyê, ne li konsulxaneyê û ne jî li ser axa Îranê, lê di dema hevdîtina bi terorîstên Hizbullaha Lubnanê re hat kuştin.

Eger şerê Ukraynayê û hevrikiya Amerîka û Çînê nebûya, Encûmena Asayişa Navdewletî dikaribû biryarekê li dijî Îranê derbixista û êrîşên Îsraîlê jî meşrûiyeke navdewletî bi dest bixista. Êrîşên Îranê yên Nîsan û Cotmehê yên li ser Îsraîlê, naveroka êrîşkar û şerxwaz a Îranê zêdetir ji civaka navneteweyî re eşkere kir.

Niha ku derfeta guhertina hevsengî û piştevaniya navdewletî ji bo rûbirûbûna Îranê peyda bûye, divê hêzên Kurdistanî û tevgera siyasî ya Kurd xwe li hember pêk anîna platformeke niştimanî ya berfereh ji bo bikaranîna vê derfeta navdewletî bi rêya dîplomasiya çalak û nûjen, berpirsyar bibînin. Pêngava yekem avakirina Konferansa Neteweyî ya Rojhilatê Kurdistanê ye.



# Şerê Îranê û Îsraîlê, derfeteke nû bo xurtkirina Şoreşa “jin, jiyan, azadiy”ê .



N. Serbest Urmiye

Piştî kuştina Îsmayîl Heniye, rêberê taqima “Hemas” li Tehranê û her wiha kuştina Hesen Nesrullah, rêberê taqima “Hizbellah” a Libnane ku her du alî jî girêdayî bi rejîma Îranê bûn ji aliyê dewleta Îsraîlê ve, rejîma Îranê careke din gefên xwe jib ji hole rakirina dewleta Îsrayîlê xurttir kirin û jibo ku bi kiriyar jî ji gefên xwe xwedî derkeve, di 1ê Cotmeha 2024an de êrîşeke berfireh a bi navê “Operasyona Soza Sadiq 2” de, 181 mûşekên balîstîk avêtin Îsraîlê.

Armanca êrîşa han gelek armanc li seranserê Îsrayîlê bûn, nemaze di “Tel Aviv” a navenda desthilatdariya Îsrayîlê de.

Di êrîşê, mûşekên Îranê li cihan ketin ku avahiyên vala bûn û yen din jî weke gerên berê hatin kontrol û pûç kirin.

**Êrîşa han dîsan rejîma Îranê ji bilî cîhan û herêmê, di hindur de jî rastî pêkol û dubendiyê him di nava aliyên siyasî û him jî di civakê de aniye ku heke berdewam be dikare weke derfeteke din bo serhildana nerazîbûnê li dijî desthilatê di Îranê de mifah jê were wergirtin.**

Bi xasmanî ku pêtên agirê şoreşa “jin, jiyan, azadiy”ê di Îranê de hêj di Îranê de bigur in.

Lê di vir de pirsiyar eva ye ka gelo Êrîşên dewleta Îranê bo ser Îsrayîlê, çawan dikarin bibin derfet bo serhildan û xurtkirna şoreşê li dijî rejîma Îranê?



Ji bo ku em bersiva pirsiyara han bidin, hewceye ku were gotin ku şerê Îranê li dijî Îsraîlê, li gor pênaseya hegerên serhildana şer di navbera du hêz yan dewletan de, şerê îdeolojiyê ye. Lewma texmîn tê kirin ku çi serkewtinek bo rejîma Îranê çine be.

Ji ber ku îdeolojiya ku bingehê şerê han tê xuya kirin, îdeolojiya desthilatê ye û piştî serhildana “Jîna”yê bi eşkere derket ku ideolojiya han êdî ji aliyê gel ve nahê şopandin ku rejîma Îranê bikare bike sedema hevgirtina gel û desthilatê di şerê dijî Îsraîlê de.

Ji aliyeke din ve serhildan li dijî desthilata Îslamî ya Îranê, di çend salên borî de hebûye û bi serhildana “jin, jiyan, azadiy”ê, pê havêtiye qonaxeke nû.

Şoreşa “jin, jiyan, azadiy”, bervajî serhildanên berî xwe, di heman demê de ku sînorênbendiyên rejîma Înarê jî hin ji aliyê ewlehiyê û him ji aliyên siyaseta serkutkirinê ve derbas kirin, karî di rêya dengvedana cîhanî de, aliyên nû weke piştevaniya cîhanî û beşdariya piralî ya hemû tex û qatên civakê, nemaze beşdariya jinan jî, ji şoreşê ve zêde bike ku hertim xurt bimîne û ji hemû derfetan mifahê wergire.

**Êrîşa Îranê bo ser Îsraîlê dikare bandorên berfireh danê ser tevgera “Jin, jiyan, azadî” li Îranê , lê ev bandor girê'rin û mifah jê were wergirtin.**

**1.** Bizava civaka hindur: ji bo ku bizavên civakî di hindurê Îranê de li dijî rejîmê werin xurt kirin hewceye ku eniya nerazîbûna gel li rejîmê û dijî şer berîntir bê kirin. . Bi terzekê ku gel li şûna krîzên derveyî, rewşa hindur li ser daxwazên xwe bisekin bişopîne û bi lidarxistina meşên berfireh û giştî yên nerazî bîne, hêzeke din bidin tevgerê (şoreşa “Jîna”yê).

**2.** Jêldebirina asta hişyariya gel bo yekîtî û yekgirtinê: Jêhlelbirina asta agahiyan li dor êrîşên leşkerî dikarin hişyariyê li ser binpêkirina mafên mirovan û pirsgirêkên civakî di Îranê de zêde bikin. Ev yek jî dibe alîkar ku tevgerên civakî xurt bikin.

**3.** Piştevaniya navneteweyî : heke di encama şer de aloziyiyên zêdetir di herêmê de derkevin û civaka navnetewey î bala xwe bikeşîne ser aliyen binpêkirina mafên mirovan di Îranê de, dibe ku tevgerên mafên mirovan bi taybetî tevgera “jin, jiyan, azadî” bihêztir bibe û zexteke zêdetir bikeve ser rejîma Îranê bê.

**4.** Morala giştî: heke aliyên nerênî yên êrîşa rejîma Îranê bo ser Îsrayîlê bi başî werin şirove kirin û gel ji merema desthilata Îranê di vê êrîşê de ku pitir piştevaniya aliyên şerxwaz ên girêdayî bi rejîme vê ye, were haydar kirin, vê demê ye ku yekîtiya gel li hember rejîmê û li dijî şer xurt dibe û ev şer weke şereke bêvêc tê hejmartin. Wê demê serhildan li dijî rejîmê cihê piştevaniyê li şer digire û dibe derfet bo xurtbûna tevgera azadîxwaziyê.

**5.** Kirîza aborî: Şer hertim bandoreke nerênî li ser rewşa abrorî heye û piraniya kirîzên aborî di heyamên şer de serhildidin. Di demekê de ku rewşa aborî ya Îranê di rewşa herî xirab di çend salên borî deye û hêla destkurtî û hejariyê heta diçe berfirehtir dibe.

Hewceye ku bala giştî ya civakê bo srer vê çendê were rakişandin. Di vê demê deye ku hizra giştî ji bilî ku li hember rejîmê disekine, alîkariyeke jî bo xurtkirina tevgera “Jin, jiyan, azadî”ê .

Bi giştî bandora êrîşê bo ser Îsraîlê li ser tevgera “Jin, jiyan, azadî” di Îranê de aloz û piralî ye û girêdayî ye bi wan fakterên ku hatine ber bas.

Lewma heke hêz û aliyên siyasî, nemaze hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê bikarin di eniyeke hevgirtî de, fakterên han li gor rewşa niha ya Îranê him di ware herêmî û cîhanî de û hin di warê navxwe û civaka bindestê rejîmê de şirove bikin, mirov dikare bêje ku pêngehek bilind ber bi serkevtinê ve havêtine.

## Nerîna



**“Donald Trump”:**

**“Divê Îsraîl êrişî tesîsên navkî ên Îranê bike”**



**“Mark Rutte”:**

**“Armanca me serkeftina Ukrayna di şerê bi Rûsyayê re ye”**



**“Yoav Galant” :**

**“ Eger Îran bifikire êrîşî me bike, em ê wek Gazze û Beyrûtê bikin.”**



**“Naftali Bint”:**

**“Îsraîl ji bo hilweşandina Komara Îslamî divê êrîşî navendên atomî û rayedarên Îranê bike”**

# Piştî êrîşa Îranê ji bo ser Îsraîlê ji her carê zêdetir xuya ye ku Îran bombeya etomê dixwaze!



**N. Eskender Ceiferî**



Piştî ku Mesûd Pizişkiyan bû serokkomarê rêjîma Îranê, hin kesan fikir dikir ku ewê ciyawaz be lê belê ya rast ev e ku ew ji serokkomarên din ên vê rêjîmê cuda nîn e û biryara wî di destên Elî Xamineyî rêberê rêjîmê de ye.

Niha jî ku destpêka gerra serokkomariya Pizişkiyan e, piştî ku Îranê êrîşî ser Îsraîlê kir, êdî ew îdia hatin derewandin ku li gor gotegotên rêjîmê Pizişkiyan ciyawaz e.

Bi vê êrîşa bi hajekên balistîk derket holê ku heke rêjîma Îranê xwediya bombeya etomî bûya, dê bi etomê êrîş bikira.

Beriya niha rêjîma Îranê careke din îdia kiribû ku ew bombeyê naxwazin û wê piştî çend heftiyên din, careke din Danûstandinên Etomî dest pê bikin. Lê pişt re hin berpirsên rêjîmê gotin ku ew rêkeftinê naxwazin.

Ev jî di demekê de ye ku di heyama desthilatdariya Îbrahîm Reyîsî û Hesen Rûhanî de wezîrên derve yên rêjîma Tehranê digotin ku êdî rêkeftina Etomî ji aliyê wan ve nakeve ber bas.

Piştî ku serokkomarê berê yê Dewletên Yekbûyî yên Amêrîkayê dewsa xwe da Joe Biden û dihat pêşbînîkirin ku dewleta Biden vegere ser gotûbêjan ji bo rêkeftina etomî bi Îranê re. Di vê navberê de Rêformxwaz heftim dibêjin rêkeftinê dixwazin lê Sipaha Pasdaran dibêje nabe rêkeftin bê kirin.Di rastî de armanca rêjîma Tehranê berhemanîna bombeya etomî ye. Ew, demê bi kar tînin û bi meyandina Oranyoma zêdetirî 20 ji sedî, nêzîkî berhemanîna bombeyê dinbin.

Niha dewleta Biden jî dixwaze rê li ber Îrana Etomî bigire û ragihandiye ew dixwazin ji bo rêgirîkirin ji berhemanîna bombeyê ji aliyê Îranê ve her karî bikin.Îsraîl jî bi Amerîkayê re hevnerîn e û dibêje nabe Îran bibe xwediya bombeyê.

Komara Îslamî jî bersiva berpirsên Îsraîlî û Amêrîkî dabû û gotibû: Wê cîhan wan gunehbariyên ku rayedarên Îsraîl dike, ji bîr neke. Piştî ku Donald Trump peymana etomî ya bi Îranê re bi tundî rexne kir, Rex Tillerson wezîrê Derve yê Amerîka jî xwest rêkeftina etomî ya bi Îranê re were guherandin û jinûve were nivîsandin lê ji bo razîkirina Îranê ew libenda piştgirîya hevalbendên xwe yên Ewrupî ne.

Tillerson got jî ku xelên rêkeftinê têra xwe tund nîn in û rê li ber bernameya etomî ya Îranê nagirin ji ber vê jî ewê cara yekê bi Cevad Zerîf hevtayê xwe yê Îranî û wezîrên derve yên welatên ku peyman îmza kirine re, bicivin û mijarê gotûbêj bikin.

Wê demê Sergey Lavrov Wezîrê Derve yê Rûsyayê ku ji bo Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî li New Yorka Amerîkayê bû, li ser helwesta Amerîkayê ya di derbarê Îranê de dabû xuyakirin ku helwesta nelihevkirinê ya Donald Trump serokkomarê wê demê yê Amerîkayê ya derbarê Îranê de û rexnekirina bernameya etomî ya Îranê cihê fikarê ye. Feranse, Berîtanya û Almanya difikirin ku eger Îrana Etomî bikeve Rojhilata Navîn, ewê pêgeha xwe ji dest bidin.

Lewma jî reşnivîsa li dijî Îranê nedan Ajansa Navdewletî ya Etomê ji bo ku niyazpakiya xwe nîşan bidin û Îranê vegerînin ser maseyê. Lê bi daxuyaniyên berpirsên rêjîma Îranê, derdikeve holê ku êdî Îran rêkeftinê naxwaze.

DYA bi raportên çalakiyên etomî yên Îranê re bi baldarî riftarê dike û gotara wezareta Derve ya Amerîkayê hemû wan pirsyaran bersiv nade ku çima Amerîka di îmzekirina raportan de dudil e û sedem çi ne lê bi gotara Hesen Rûhanî zelal dibe ku dorpêçên nû yên aborî, gefê li rêkeftinê dikin. Rêkeftina etomî di roja 14ê Tîrmeha 2015an de bi tevlîbûna welatên ewropî hatibû îmzekirin û li gora wê, Îranê hin çalakiyên etomî kêm dikirin û di hember de jî dorpêçên aborî li ser Îranê dihatin kêmkirin.

Îsraîlê ji destpêkê ve ragihand ku ew, vê rêkeftinê naxwazin. Beriya niha jî berpirsên saziya Nehêlana Çekên Etomî ragihandibûn her qasî ku Îranê bi hemû wan welatan re lihev kiriye, lê çavên Ewropiyan li Amerîkayê ne. Her biryarekê ku Waşington distîne, ji wan re dibe bandor. Berîtanya hewl dide DYA razî bike ku raportên li ser çalakiyên etomî yên Îranê demlidest îmze bike lê Amêrîka li pey planeke din digere.

Ji bilî berpirsên bilind ên Îsraîlê, fermandarên wan jî didin xuyakirin ku eger rêkeftin bê kirin, Îrana Etomî, wê Rojhilata Navîn dagir bike.

Almanya, Berîtanya û Feransê ku rolele mezin di rêkeftinê de hene, dibêjin bi meyandina 20 ji sedî zêdetir a Oranyomê, êdî derfet ji bo rêjîma Tehranê çê dibe ku zêdetirî berê bo ser cîhanê bibe gef.


Di beşeke din a daxuyaniyê de tekez hatiye kirin ku meyandina vê asta Oranyomê ne ji bo karûbarên pizişkiyê û ênêrjiyê ye lê belê li tevahiya cîhanê, ev asta Oranyomê tenê ji bo karûbarên çek û berhemanîna bombeyê têne bikaranîn.

Piştî ku Îranê bi hajekan êrîş kire ser Îsraîlê û ragihand ku ew êdî rêkeftina etomî naxwazin, li bendê ye dewletên Rojava karvedaneke tundtir nîşan bidin.

# Heta miletê Kurd bindest be, gelê Tirk, Ereb, Faris jî dê nikaribin di nav xweşî û azadîyê de bijîn!



**N. Cano Amedî**




Di pêvajoya dîrokê de, mixabin em di warê pêkvejiyanek hevrêzî, hevahengî, civakî û demokratîk de, tu helwest û nimûnek erînî ji alîyên desthilatdarên dewleta Tirk, Ereb û Farisan de nabînin.

Wan hebûn û jiyana xwe her li ser sîyaseta dagirkerî, qetilkirin û talankirinê domandine. Di xapandin û karên bêbextîyê de xwedî huner û pispor in. Çand û karekterê wan dişibe hev. Di heman demê de karbidest û rêvebirên tirk, ereb û farisan desthilatdarîya xwe li ser şer û xwînê domandine. Pirê caran çand, rastî û karektera xwe ya talankirin û xenîmetê di binê kirasê olî de domandine. Ev çand, li ser bingeha qetlîam û jenosîdan hatîye avakirin û meşandin. Ev çand, pirî caran di bin navê ENFAL û FETÎHê de jiyana netewan û mirovahîyê serûbin kirîye; rê li ber trajedî û travmayên civakî yên kûr vekirîye. Zalim û dîktatorên wan welatan, li gorî naveroka hinek ayetan jî, ji xwe re fetwayên tawankarî afirandine û civata xwe jî kirine şirîkê van kiryarên xwe!

Gava em li rûpelên dîrokê dinhêrin û dixwînin, em dibînin ku desthilatdarîya hersê alîyan jî li ser çanda wêrankirin û talankirinê geş bûye. Fikra “fetîhê” xala wan ya hevbeş e. Loma jî felsefe, ol û bawerîyên wan bi “fetîh”ê ve girêdayîye. Felsefe û naveroka fetîhê bi xwe li ser stûnên talan û dagirkerîye dimeşe. Hevoka GANÎMETê jî weke bertîlek efsûnî û pîroz, civatên nezan û paşdemayî cezb dike. Zalim û dîktatorên wan civatan, ji bo milet û xelkên din kedî bikin û li gorî desthilatdarîya xwe birêve bibin, hedef û wargehên şer zîndî dihêlin; civata xwe bi tirsê dorpêç dikin û weke civatek şervan her gav amade û mobîlîze dikin.

Weke nimûne; di dema jenosîda HALEPÇEyê de hinek hemwelatîyên ji Filistînê û hinek welatên ereban, hem li ser navê fetwayên dînî, hem jî bi şowenîzma erebî û di binê navê ENFALê de, li Başûrê Kurdistanê beşdarî qetlîam û komkujîyan bûn. Rêvebirên sîyasî û delegasyonên wan welatan di hemû qadên navnetewî de li gel Sedam Husênî cîh girtin. Piranîya dewletên mezin û çepgiran û heta dewletên ku xwe bi navê sosyalistîyê didin nasîn jî li hemberî vê barbarî û jenosîdê bêdeng man û çavên xwe ji vê tewana mirovî re girtin.

Di 5ê Nîsana 1991ê de, bi biryara Neteweyên Yekbûyî, ji bo ‘‘herêma bakûrê parelela 36an” qedexeya firîna balafiran hate îlan kirin û di bin navê “hêza mîrkut” de hêza parastinê hate tayîn kirin. Ev herdu biryar jî, di eslê xwe de, ji bo parastina gelê Başûrê Kurdistanê bûn û rê ji destkeftinên Dewleta Federe yên îro re vekir. Di wê demê de, li hemberî ‘’hêza mîrkut’’, bi navê ‘’antiemperyalîzmê’’ bertekên herî mezin alîyên îslamî û çepgirên welatên dagirkerên Kurdistanê ne nîşan dan û li dijî vê biryar û helwestê derketin. Ji dervî PKKê, hemû partî û rêxistinên kurdan kêfxweşîya xwe îfade kirin û piştgirî dan biryara Netewên Yekbûyî û ew biryar û hemleya navnetewî weke gaveke erênî nîrxandin. Lê mixabin piranîya beşên civata dewletên dagirkerên Kurdistanê li gel dewleta xwe cîh girtin. Herweha piranîya îslamî û çepgirên van welatan, bi zanîn an ji ber tengfikrandina îdeolojîyên xwe, gotina ‘’antî-emperyalîzmê’’ weke mertaleke sîyasî bi kar anîn. Di encamê de, di cepheya ku li dijî mafên kurdan de cîh girtin. Qaşo, ew kiryar û hewldanên hanê, lîstîkên hêzên emperyalîst bûn, bi wî awayî jî parastinek êrîşkar ji bo veşartina karektera xwe ya şoven û nijadperestî bi kar anîn. Em baş dizanin, hinek ji van alîyên ku em behsa wan dikin, her dem piştgir û aqilmendên dewleta xwe ne; weke propagandîst û telalê taxê, dixwazin karekterê dewleta xwe, hewldanên emperyal û dagirkerîyê veşêrin û ew weke erkdarên pasevanîyê tevdigerin.

Îro jî em dibînin ku piranîya wan qaşo li dijî neheqî û hewldanên emperyalîzmê tevdigerin, lê naxwazin kiryar û pratîkên dewletên xwe, zilm û neheqîyên desthilatdarên xwe bibînin. Bi sed salan e ku sîyaseta jenosîd û talankirinê; qetlîam û nefîkirin li erdnîgarîya Kurdistanê kêm nebûye, her ku diçe zêdetir dibe. Heta îro tu dijberîyek girseyî li hemberê neheqîyan nehatiye nîşan dan! Her tim; karekterê kerr, kor û lalbûnê pejirandine. Em dibînin û dizanin ku li gelek welatên cuda rewşenbîrên azad û xwedîbext, hêzên muxalif û dijber li hemberî kiryarên dewleta xwe, li gel mazlûman cîh digirin û ji bo sîstema desthilatdar têkbiçe tevdigerin. Lê mixabin piranîya çepgir, rastgir û oldarên van dewletên ku Kurdistan di nav xwe de dabeş kirine, yan li hemberî van zilm û neheqîyan bêdeng dimînin, yan jî li gel zalimên xwe cîh digrin. Bêgûman, dost û hevalbendên milletê Kurd ne mixatabên van rexneyan in! Em her dem wan cihê dibînin û rêzê li wan digrin. Gotinên me ji wan alîyên durû, li hemberî neheqîyê bêdng û mîsyoner re ne.

Ji ber ku ew di warê bîrûbawerî û dadwerîyê de ne azad in, bi aqilê desthilatdarên xwe tevdigerin ji bo wê, em dibêjin piranîya hêzên îslamî û çepgirên tirk, ereb û farisan fêhm nekirine ku heta miletê kurd azad nebe, gelê wan jî dê azad nebin; dê li ser erdnîgarîya vê navçeyê xweşî û aramî geş nebe!

Ew alîyên ji sîstema FETÎHÊ diçêrin, berjewendî û dahatûya xwe bi dagirkeriyê ve girêdane, tu carî naxwazin ev sîstem têkbiçe. Ji ber van sedeman e ku ev beşên civatên dewletên dagirker ku em behsa wan dikin, bi hev re dibêjin: “Xwedê zewalê nede dewleta me, ger dewleta me têk here, cîhekî em lê bistirin tuneye!” Ev psîkolojî û hişmendî bingeha sereke ya tirsa sîstema dagirkerî û talankerîyê ye. Ev hişmendî, tirsa wendakirina bazar û qezencên ji neheqî û dagirkerîyê tên bixwe ye. Ev wêneya ku hemû xwe têde dibînin û îfade dikin, pergala FETÎHÊ bixwe ye! Ji ber vê yekê jî gava mijar dibe pirsa kurd û Kurdistanê, hemû yekser bi hev re hevkarî û tifaqên hevbeş yê dijberîyê ava dikin.

Ev rastîyên hanê carek din, dide îspatkirin ku heta em weke milet tevnegerin, bi hişmendîya netewî gav navêjin; heta ku em xwe ji qeyd û bendên îdeolojîk, berjewendîyên hizbî û kesayetî azad nekin, wê êşa me bi dome û birînên me her tim bên xurandin. Ne îdeolojîyên tundrew, ne bîr û bawerîyên teng û ne jî çîrokên doyin ji me re nabe derman. Pêwîstîya me bi hişmendîyek netewî, bi sînerjîyek milî û kelecanîyek welatparêzî heye. Ji Dîaspora bigirin heta hemû beşên Kurdistanê, li ser bingeha hişmendîya welatparêzî divê pêlên têkoşînek hevbeş û kelacanîya hestên netewî geş bikin.

Divê em ji bîr nekin, heta ku qeyd û bendên dagirkerî û bindestîyê di sitûyê miletê Kurd û kurdistanîyan de bin, dê gelê tirk û ereb û faris jî nikribin azad bibin; dê ew jî nikaribin ji qeyd û bendên xwe azad binin û dê ew jî nikaribin xweşî, azadî, aramî û demokrasîyê bibînin.

# ÎXANET!



N. Hasan Harrani

Ev peyv peyvekî girînge. Wate û hukmê naveroka peyva îxanetê gelek mezin û giran e. Bi wateya xwe kar û barê civakî hildaye. Dîrek têkelî kar û barê civakîye.

Bi gorî danasînên ferhengan ev peyv wekî xerabî, xwedî nîyeta nebaş hatîye pênasekirin. Her wiha tevgerekî dijayetî, xebatekî valaderxistin an jî sabotekirina armanc an jî helwestekî îfade dike. Rastîya danasîna peyva îxanetê ji xwe ev e.

Li gorî beş û armancan mijara îxanetê ji yên herî biçûk têkilîyên nabeyna du kesan bigirin heta yên nabeyna grup, bizav, partî û doza miletekî eleqeder dike. Sînorê wate û kar û barê vê peyvê li gorî eqd û armancê tê dîyardekirin.

Loma jî ev peyv bi kar û barê dijî armanc û bihevrebûna kesan, grupan, bizav û partîyan û heta miletekî hatîye îfadekirin. Bi kurtasî mirov dikare bêje îxanet, xebatek bi nîyeta xerab û bi zanetî alîyek li dijî alîgir an jî alîgirên eqd yên din e.

Yanî ev peyv di warê hiqûqî de jî hatîye pesendkirin û têkilî û armancên kesayetan, alî û beşên civakê de peyvekî herî girînge ku cih girtîye. Ev peyv di hemî zagonên huqûqî ku jibo bi rêkûpêkirina têkilîyên nava civakê bên tenzîm kirin hatîye bicihkirin.

Lihevkirin di vê peyvê de xala hereketkirinê ya girîng e. Lewre hukum û wateya peyvê di rûdana çalakîya li dijî eqdê bê kirin derdikeve holê.

Di vir de xala herî girîng eqd e. Yanê lihevkirina ser xalên hevbeş yên alîyane. Ger çalakî û kiryar li dijî valaderxistina eqdê be ewçax fiêl wekî îxanetê tê pênasekirin. Li holê eqdekî, lihevkirinekî dildarî tinebe, herkes jibo armanc û mebesta xwe kar û barê xwe bike û kar û barê yekî xisar bide yê din an jî li dijî kar û barê yê din be ev nayê wateya îxanetê, ev dikeve çarçoveya reqabet/himberîyê û di nava pênaseya îxanetê de nayê qebûlkirin. Jibo îxanet bê hesibandin divê di nabeyna yên hevudu sûcdar dikin de berê eqdekî lihevkirinê ya li ser armancekî hevbeş hatibe kirin hebe. Ger ev tinebe fiêla hatibe kirin jî di nava çarçoveya îxanetê de neyê dîtin.

Ev tiştên ku me heya niha anîye ziman jibo têkilî û mafparêzîya kes, grûp, bizav û partîyên civakek an jî miletek azad de dijîn derbas dibe. Fiêlên di nabeyna van beşên ku me rêz kirîye ku di nava milet an jî netewek azad û serbixwe de dijî yek jî nakeve dereceya pênasekirina îxaneta netewî. Lewre tiştên me di nava van beşan de rave kirîye hemî berjewendî, armanc û mebestên navxweyîne. Sînorê wan nagihêje sînorê mijar an jî mijarên netewê.

**Îxaneta netewî jî heye.**

Niha îca emê bên ser vê xalê û emê sînorê vê peyvê bêhtirîn ji hevdu zelal bikin. Lê bi gorî min ji mijara îxaneta ya li nava me Kurdan zêdetir, sekinandina li ser sebebên vê mijarê bêhtir girîng e.

Îxanet li nava herkesî û di nava her miletî de heye. Lê li ti deverekî bi qasî ku li nava me Kurdan diqewime li nava wan naqewime.Çima?

Di nêrîna min de dîsa ev xisûsîyetekî ya di nava me Kurdan de ye. Kurd û bi piranî jî partî û bizavên sîyasî sedemên vê mijarê bêtir di serdehatin û gerandina fitneya dijminên Kurdan ku di nava wan de digerîn de dibînin. Ev jî rast e û mirov nikare înkar bike an jî ji nedîtinê de were.

Lê bi dîtina min ev mijarekî talîye û şûna em vê nexweşîya xwe timî bavêjin ser dijminên xwe û wan sûcdar bikin em dixwe de bigerin û bibînin baştire. Em çiqasa vê mijara îxanetî tevdilê dijminê xwe bikin em ji vîya pak nabin. Emê vê rastîyê jî bibînin lê divê pêşî em mijarê di hişmendîya xwe de, di nêzîkatî û daxwazên xwe de bibînin.

Di nava me Kurdan de nexweşîya herî girîng ev e. Çanda parvekirinê, dabeşkirina hêz û aborîyê a adil ya navxweyî di nava me de çênebûye.



Tiştekî yan tenê yê min e yan jî ne yê ti kesîye. Hişmendî û rihê lêxwedîbûnê bi vî awayî hatîye çêkirin.

Ev nexweşî bi temamî bi vî rengî di nava partî û bizavên me Kurdan de jî heye û bi vî rengî dimeşe. Di mijara îxanetê de ger îlla em li rêça dijminên xwe di nava xwe de bigerin ew jî ev e: Çanda bîadê. Peyva bîadê di nava me Kurdan de wekî tabihê hatîye transkirîbekirin.

Çanda tabihîyê çanda Ereban e. Yan her kes her milet bîadê wan kirîye yan jî bi darê zorê û bi birra şûrî ji holê hatine rakirin. Ên ku tabih nebûne teqez bela û karesatên mezin li serê wan gerandine.
Çanda tabihîyê çandekî herî xerabe jibo pêkvejîyane civakê. Di vê çandê de ti kes xwedî rastî û reng û hebûna xwe nîne. Ê biçûk di xizmeta yê mezindeye. Yên lewaz jibo hebûn û pêşketina yên xurt heye.
Ev çand bi awayekî herî xerab di hiş û hizra me Kurdan de cih girtîye. Û ev di nava hemî bizav û partîyên me Kurdan de pir hindik, kêmê hev an jî zêdeyê hev dijî. Yanî hewceyê dijmin nemaye çand û hişmendîya dijmin di rih û mejîyê me de di hişmendîya me de hukum dike.
Di nava sîyaseta Kurdan de mixabin rih, hest û mêjûyekî medenî ku li ser dabeşkirina hêzê, aborîy rêveberîyê wekî keltûrekî hevbeş nehatîye afirandin. Loma jî her hêzekî her tişt tenê ji xwe re dixwaze. Nerazîbûnên li hemberî xwe jî wekî îxanet raveyî gel dike.
Mijara partîbûn û qada gel jibo wan wekî zevîyên çandinîyê tê zanîn. Çawa ku eşîran li ser axê û zevîyan şer dikir, ev rengê şer veguhezîye tekoşîna nabeyna partîyan ya li ser parsêlkirina ax û gelî. Welat û tevî miletê ser wê axê jibo xwe wekî zevîya çandinîyê dibînin û dibêjin ev yê mine ti kesek jî nikare were vêderê. Ev jî dibe sedema pevçûnan.
Tawanbarkirina hevdu ya li ser van probleman jî bi hêsanê wekî îxaneta netewî û welatî eşkera dikin. Berîya lihevkirinan hevudu bi vê mijara îxanetê îtham dikin.
Hişmendî eve. Wekî me li jor jî got helwesta sereke tabihkirine di vê tekoşîna li hemberî hev de. Yanî teqez divê alîyekî stûyê yekê xwar bike û bike binê nîrê xwe. Kurd hevudu nakin mîr, hevudu dixin nîr.

Li cihê ku kirina binê nîr hebe an jî tinekirina alîyek hebe qanûna jîyanê a xwe parastinê dikeve merîyetê. Ew qanûn xwesteka mayîna li jîyanê ye.
Di bijartina mayîna li jîyanê de rengê mayînê ne girîng e. Ev zagonekî xwezayê ye.Ya girîng mayîna li jîyanêye. Jibo yê ku vîya armanc bike hevkarîya wî ya bi dijminê alîyê din ne girîng e. Ya girîng xurtbûn û mezinbûna hêza ku xwe bisipêrêye. Kî karibe wî biparêze xwe mecbûr dibîne pişta xwe dide wî. Ev hêz gelek caran dijminê dijminê wî yê miletê wî bûye. Tiştek îronîke lê rastîya me Kurdan di dîrokê de gelek caran bi vî rengî rûdaye.
Yanî divê em bizanîbin ku di nava me Kurdan de yê ku hebûna îxanetê diafirîne jî dîsa ev hişmendîya me Kurdan e. Yanî hişmendîya hevdu neqebûlkirinê û tinekirinê ye. Em ne xwedîyê zanîna bi hevdu re jîyanê ne. Ev ne nexweşîyeke ku neyê tedawîkirine. Ger rojek hemî partîyên Kurdan fambikin ku bê hev hebûna ti kesî jî ne mimkûne li ser axa Kurdistanê wê ew çax pêkvejîyana bi hevdu re jî qebûl bikin û wê ev çanda tabihkirinê jî ji nava xwe rakin.

Ew çax wê çande demokrasî û dabeşkirina hêzê jî çêbibe.

# Çima me jina rexnegir tune ye?





N. Vênûs Fayîq
W. Hesen Mukerem

Niha jî li ser vê baweriyê bê biguman mêzey şiyana jineke nivîskar dikî. Bi mebesta bikêmzanîn ji feyde û şiyana jinê digotin li pişt her jineke wêjeyî de zilamek heye ku ji bo vê dinivîse, ma ev nine ku bi mebesta di çarçoveyê de ragirtina jinê û ragirtina vê di pileyekê li jêrê zilam de gotine ku li pişt hemû zilamekî dahêner de jinek heye?

Heta niha ji bo vê gotinê şiroveyeke zilamane hatiye kirin ku gotine jin alîkariya zilamê dahêner bike, ji mileke din de jin xistine pişt zilam, taybetmendiya dahênerî pêşkêşî zilam kiriye û jin jê dûr xistiye.

Heta di aliyên di hundrê lîstika wêjeyî de jî li ser navê zilam binav kirine, dibe ku aliyên rexneyên wêjeyî de ku heta niha zilam tenê karê xwe bizane.

Ji aliyeke din de ye ku dibe pirs, di van salên dawî de û digel berfirehbûna warên wêjey û zêdebûna hejmara jinên helbestvan û medyakar, rojnamenivîsan, çima me jina rexnegir tuneye?

Me ti jinek tuneye ji bo şirovekirina nivîsên wêjeuî bitaybet ji bo zilaman encam bide?

Çimkî rê ji jinê re nehatiye dayîn da ku rexne bike, hertim hatiye rexnekirin.

Jinek ku bi vê yekê hatiye tawanbarkirin ku zilamek li pişt nivîsên wê ye û jêra dinivîse dema ku wisa çawan li navenda wêjeyî de weke rexnegirek tê qebûlkirin.

Jinek ku ji ber vê yekê birine, pişt zilamekî behremend û destkevtiyên wî rawestandibin êdî dê çawan rê bê dan ku rexnegir be?

**Beşek ji wan şaştiyan dikevtin li ser stûyê jinan bixwe, ew tiştekê diguherin bi tiştek din ve, destkevtên wêjeyî ji aramia di anv ,alê de, feydeya wêjeyî bo perwedekirina zarokan, nivîsîn bo amadekirina xwarin û şuştina kincan.**

Yan teslîmbûna bi namûs û şerefê ku hêsantirîn tiştek ku wê pê bitirsînin û dûr bixin li hemû tiştî..

Êdî ev jinên ku di wî milî de çalak in û çavnhêrin bi berhevdanê, ev wisa dizanin ku heta dawiyê di qonaxa xwepeydakirin û bixwe nivîsînê de ne, ger zilamek destxweşiyê ji wan neke nafirin û nabin xwediyê kesayetiyeke wêjeyî a kêrhatî,Dema ku jinek li her milî de li qeraxa şoreşê ragirti bin.

**Êdî kêm jin hene ku her li zarokatiyê ve wisa hîn kiribûn ku ev bixwe hizir bikin û hişê xwe bikr bînin, her di serdemê zarokatiyê de çîrokên wisa bo keçikan re xwandine ku li naveroka wan de keç wek xanima malê ye û şîr dide zarokê, tevahiya lîstikan li ser bingeha zayendê temaşeyî destê kiçê dike û dev jê ber nedane ku keçik xwe bixwe hilbijêr e, ku bilî xwe wan aliyan hilbijêr e ku bikare xwe li hundr de peyda bike.**

Heta niha di piraniya cihên giştî de jin ji zilaman hatiye veqetandin, êdî şikandina vê taboya han û destkarîkriina vê kultûrê wisa hêsan nine, beriya her tiştî di civakeke weke civaka me de yekemîn xisar ji namûsê dikeve.

Sebebek din jî heye ji bo nebûna jina rexnegir di navenda wêjeyî de ev yeka ye ku heta niha jî rexne û bitaybet rexneya wêjeyî karê zilaman hatiye zanîn, jin ya ku li ser wan e nivîsan li ser wan bixemlînin û zilam babetên rexnegir li ser wan binivîsin.

Heta piraniya keçikan ku bera xwe didin bi medyayan û pirogiramên televîzyonî pêşkêş dikin mijar eva nine ku feydeya wan heye, belkû mijar nav û deng peyda kirine û tijîkirina pêgehên civakê bi wêneyên wan e.

di wan aliyan de jî hertim jinên wisa birine ku hunera xwe xemlandin û bedevkirinê hene, kêmtirîn jina ku xwedî hizra serbixwiya xwe hebin ku beriya xwe xemlamdinê, hizra pirseke wêjeyî hebin şiyane herin.

Kêmin ev jinên ku girîngî dabin bi rexneyên wêjeyî, ev hejmara kêm jî zêdetir wek milê akademîk û li zaningehan de li ser wan kar hatiye kirin ku ev yek jî nake beşdariya bandordar li warê wêjeya giştî de.

Piştire pirsgirêk ev yeka ye ku jin di lîstikên wêjeyê de çi mîna helbestvan, romannivîs û nivîskar bigiştî heta niha bingeheke bihêz ji bo amadehiyeek bibandor ava nekiriye, zêdetir di xema pêşvebrina xwe û naskirinê de ye nekû berfirehkirina bilindahiya hizrkirina dewlemendkirina dîtingeha cîhanî.



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjeya bidarvekirinan li girtîgeha Qizilhisar a rêjîmê de gihîşte 10 haletan

Li halekê de ku amara bidarvekirinan li heyva derbasbûyî de zêdetir ji 69 haletan bû, rêjeya bidarvekirinan li girtîgeha Qizilhisar a rêjîma Îranê ji 11ê rezberê heta niha gihîştiye 10 haletan.
Pêka rapora Navena Mafê Mirov li Îranê, amara girtiyên bidarvekrî yên li girtîgeha Qizilhisar a rêjma Îranê ji roja Çarşemî 11ê Rezberê heta niha gihştiye 10 haletan û vê navenda mafê mirovî li roja Çarşemiyê, ragihandibû ku li vê rojê de 9 girtî li girtîgeha Qizilhisarê de hatine bidarvekirin.



Herwisa welatityek ê bi navê "Mewlûd Xalidiyan" ê xelkê gundê "Qamlû"yê ser bajarê Qurwê ku bavê zarokekî ye û ji aliyê rêjîmê ve bi tohmeta kuştina bizanebûn sizaya bidarvekirinê bi ser de hatibû sepandin, li roja Înê 13ê Rezberê, li wê girtîgeha rêjîmê de hate bidarvekirin.

Pêka vê raporê, "Fezlullah Pûrnesîrî, Elî Memeşlû, Murtiza Ebdulhusênpûr, Sabir Heqmuradî, Bêhnam Husên Destcirdî, Mewlûd Xalidiyan û jinek û 2 kes ji xelkê Efxanisatnê ku navê wan nehatiye zanîn li wan çend rojan de li girtîgeha Qizilhisarê de hatine bidarvekirin.

## Rêjîma Îranê kasibkarek kuşt û 2 jî birîndar kirin

Roja Pêncşemiyê kasibkarekî Kurd xelkê Emîravaya Bokanê bi navê Yûsif Deştî temen 38 salî li ser riya Mihaba- Bokanê kevte ber desrêjiya gullên hêzên cinayetkare rêjîmê û hate kuştin.



Piştî kuştina Yûsif, hêzên rêjîmê ku bi şika hebûna barê qaçax teqe ji wî kiribûn, çi tiştekî qaçax ku li maşîna wî de peyda nekirine, termê wî radestî malbata wî kirine û bi gefkirinê gotine malbata wî ku divê bêjne xelkê ser barê qaçaxe Meşrûbê hatiye kuştin.
Hêzên dije mirov ên rêjîma Îranê li nav bajarê pawê de teqe li maşîna kasibkarekî kirin ku li encam de 2 kasibkar li maşînê de bi dijwarî birîndar bûn.

Herwisa hêzên dije mirov ên spaha pasdaran a tirorîst li nav bajarê Pawê de teqe li maşîna kasibkarekî kirine ku ji bilî wî kesekî din jî li maşîna wî de bûye, ku li encama teqeya wan terorîstan de ew 2 kasibkar ên bi navên "Pêyman Neqîzade û Arman Neqîzade" bi dijwarî birîndar bûne.

Pêka vê raporê, hêzên hov ên spaha pasdaran a terorîst li meydana "Mewlewî" ya bajarê Pawê, bi şika hebûna alavên qaçax li vê maşînê de, bê agehdarkirna berê û bi awayê rasterast teqe li wan kasibkaran kirine ku pê û zikê wan bi dijwarî birîndar bûne.

## Rêjîma Îranê sizaya bidarvekirinê bi ser ciwanekî xelkê Çaldiranê de sepand

Dadgeha rêjîmê li bajarê Urmiyê, bi tohmeta "bexî" sizaya bidarvekirinê bi ser ciwanekî xelkê bajarê Çaldiranê de sepand



Taya 1 a dadgeha înqilab a rêjîma îranê li bajarê Urmiyê bi daweriya "Necefzade" sizaya bidarvekirinê bi tohmeta "bexî, bi ser ciwanekî xelkê gundê "Sêgirik"ê ser bi bajarê Çalidiranê yê bi navê "Hemîd Husênnijad Hêyderanlo" de sepand.

Navbirî li 24ê Xakelêweya 1402 li sînorê Çalidiranê de ji aliyê hêzên sînorî ve hatibû binçavkirin û piştî çend demjimêran lêpirsînê, bo girtîgeha îdareya îtilaat a rêjîmê li bajarê Urmiyê, hatibû veguhastin.

Navbirî heyamê 11 heyv û 10 rojan li jêr îşkenceyên dijwar ên cesteyî û hundirî li girtîgehên îtilalat rêjîmê de neçar bi îrifakirina bi zorê bû.

Pêka rapora Kurdpayê, dadgeha rêjîmê bê hebûna ti belgeyek û bi tohmetên bê binyat û çewt, tohmeta Bexî bi ser wî kasibkarî de sepand û navbirî ku bavê 3 zarokan e, bi tenê 2 car bi rêya telefonê digel malbata xwe axiviye û heta niha ji mafê hebûna parêzer, bêpar bûye.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (479)